

Kiriyaariya Roja Nû: ji bona erdên Sûriya û Lîbanê, 35 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 4 lîreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê; 25 Qemerî.

ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc: Weqif Tabet, Telefona Dîwanê: 74 04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

Cengê Cihana Qediyaye

Japona jî, bê şert û bazar xwe avêtine bextê Hevalbendan û pê li rohelat û li roavayî, şerê cihanê ê mezin gihaye dawiya xwe. Stolên amerîkanî û britanî ketine benderên japonî û lekên Hevalbendan bi piranî derketine axa japona a mader.

Şer, di erdê Robelatê Dûr de, û li giravên Pesîfîkê şerêkî zehf diwar bû; lê zanîn û mēraniya leşkerên Hevalbendan û nemaze yên amerîkanî, piştî japona şênandin, û Sovyetistanê derba mirinê a dawîn da leşkerên Mikado. Zorkerên mezin jî dinyayê hatine rakirin û di pêşiya hemî miletên cihanê de, dergehên heq û edaletê vebûne.

Herwekî zehf caran, ji aliyê Hevalbendan ên mezin, hatiye dan zanîn, ev şerê xedar ji bona hikimraniya heq û edaletê û ji bona rahetî û selametiya miletên cihanê û xesma miletên biçûk, çêbû ye. Mêr û mērxas bi sed hezaran mirine, da ko rayê zorkeriyê jî dinyayê bête hilkişandin, da ko heq û edaletê biba Armanca hemî miletan, da ko hemî miletên dinyayê, ji heq û edaletê, para xwe bibin. Miletê kurd jî di nav miletên cihanê de miletê e. Kurdistan jî, di nav welatan de wêlê bû.

Îro neh milyon kurd, li Hevalbendan Mezin dinêrin, yê ko zilm û zorkerî pelixandine û miletên Cihanê wê bigehîştin heq û edaletê û pê binayêdên silh û aştîtiya Cihanê deynin ser stûnên qaim.

Em, gehêldin rîya heq û azahiyê tînin bîra xwe, fidakariyên ko wan camêr û mērxas kirine (fînan pêş gavê xwe, hemî miletên dinyayê minetdar wan egdane, û em jî kûrahiya dilê xwe dibêjin rûhê wan şa be, û Xwedê jin û zaroyên wan gernesan jî renc û ezaban biparêze.

Pirseke girane ji yên îro

KURDISTAN

- I -

Pirsa Kurdistanê, bi awakî ecêb, bi ser ya Polonyayê ve diçe. Pirsa Kurdistanê ya nijadekî ye ko pozibîlînd, mērxas û şerî e, yê ko dizane azahî û serbestiya xwe, bi fidakariyê giran û bi bihaqê xwîna xwe biparêze. Lê belê, kambaxiya wî ev e ko jî xwe re, di nav cîranên xurt de, wêlêtekê bijartîye. Gava cîranê xurt yek e, xirabî ne hinde mezin e, rast e ko ev cîranê xurt erdê cîranê xwe ê qels distîne, lê miletê bindestbûyî, dikare bitevayî, şerî miletê xurt bike û pê xwe jî destê wî xelas bike.

Kambaxiya mezin ev e ko miletê bikeve destê çend miletên xurt, û erdê wî di nav wan de, bête par kirin. Ko wîlo bû, ji bona miletê hêstirkeî, çavortî û ciwanmēriyê ecêb dibêtin, da ko bikare hegîna xwe a nijadî biparêze, û dil û bawerîya xwe, ji tada destên neyar bifîlîst. Kurdistanê ev çavortî û mērxasî şerî cihanê kiriye, û jî ber vî yekê, dînya jî nû ve bi pirsa Kurdistanê mijûl dibe.

Ji Kurdistanê îro bi tenê nav û baweriyê heye. Welatê kurdan ev erd e ko di nav bîra Çiyayê Araratê, Diyalê, Dicle û Ava-Reş de ye. Mezinahiya vî erdê 500.000 kilometir gurgûge ye, û ev ax di nav cîranên wê ên mezin; Îran, Tirkiyê û Iraqê de, hatiye par û perçe kirin. Di axa Îranê de, Kurd der erdên Kîrmanşax, Xoy û Makuyê rûdinin, û di hin derên Îranê de jî, ji zewe re gund û bajar awakirine. Di Îranê de, 3.000.000 kurd hene.

Di Tirkiyayê de, kurd sinorên Tirkiyê û Îranê de rûniştin ne û nemaze di dora gola Wanê de; û der vî erdî, jî hêla jêrîn ve, 3.500.000 in. Di Iraqê de, milyonek kurd heye; di axa Welatê Mîsilê a berê de, û ew jî hin heqên xas parmand in. Di Rûsyayê de, li dora Rewan û Kars ê 125.000 kurd hene. Dawî emê bînin bîra xwe ko di axa Suriyeyê de; nemaze li bakurê Helebê, û di Sûriyê, Bakurî de, der Erdê Ewliyayî û li Şamê 150.000 kurd rûniştin ne.

Dîroka Kurdan

Heke tarîx û dîrok, mezinahiya berê, karên bilînd û hêja, yê ko bav û bapiran pêk anîne, li ser qedar û serniştên miletêkî tehsîr bikirana; her wekî hin bawer dîkin û dibêjin, miletê kurd diwîya bû ne mîna îro, bibe hêstêrî lepê miletên jê xurtir, lê hakîm û axayê Welatên Rohelatî. Lê hejvê ko dîrok di nav kaxezên bê zimên de radîkeve, û qedrê her miletî li gora xebata wî a îro lête gir tin.

2.000 sal, berî Îsa Pêxember, miletêkî ko jê re Gutu an Kîtt dîgotin, axa Dicle, ji zewe re zeft kirî bû, û ber bi çar hindavên dora xwe ve, xwe pehin û fireh dikir. Nijadekî din yê ko bi navê Kasîl, hattî bû naskirin, ji Çiyayê Zegrosê, daketî bû Babilonyayê û 600 sal hikmî wê kirî bû. Ev her du nijadê kal û kalîkên Kurda ne. Kal û kalîkên hêjo; lê dîrok heta 600 sal piştî Îsa Pêxember, di heqê wan de, hindik dîzane.

Miletên din, navine dârthev li Kurdan kirine; Asûriya jî wan re dîgotin Kurdu; Ermeniyên Gortux; Yewnanîyan Garduxî, gortse an Sîrî. Heta ko tiştên miletên jorin, heqê kurdan de gotine, xwezê bête seh kirin, xebateke zor dibêtin.

Ji sedsêla heftemîn û heta nehemin ereba erdê Kurdistanê vegirtine. Lê gava Xelîfe li Bexdayê rûniştin; kurdan carina hikmî hikûmeta wî dikirin. Di sedsêla XII hemî de, leşkerên kurd şerî xwedîxaçan kirine, di bin emrê Siltan Selaheddîn de. Di wê wextê de, mezinahiya Kurdan gîha bû merîba xwe a bilîntir. Di sala 1514-an de, tirkan dest avêtine Kurdistanê. Seltî I, Kurdistan - ya ko xwedî Istîqlal bû - xîst destê Mela Idrîs, kurdekî jî Bîdlîsê. Mela hin eşîrên kurd şîyan-dînin Erebiştanê û hin eşîrên Erebiştanê anî Kurdistanê, da ko pê, kurdekî hemî bibin sin-nî. Lê belê, her çend jî tirk qedrê Kurdan digirtin, di wê wextê de, kurd ecem jî tirkan çêtir didîtin.

Mensûr ŞELÎTA

Xwendevanên Delal! Roja Nû bê arîkariya we nikare pêve here, nikare Armanca xwe pêk bîne, û li ser rîya xebatê bimeşe. Ewe heşt hejmar ên ko derketine, çar bi zîmanên kurdî û çar jî bi yê frensîzî, jî kerema xwe, roj berî rojêkî kiriyaariya wê rêkin.

PÊXEMBERÊ ME

« Rehmet û Silava Xwedê lê bit »

Dîvê, emê her car, adetên pêxemberê xwe, bînin pêş çavan û li gora taqeta xwe, bidin pey adet û tevgerên di wî ên mezin û qîmetgiran. Pêxemberê me, Cenabê Mihemed gelek ji paqîjiyê hez dikir, rû û destên wî ên mibarek, her car zehf paqij bûn û cilîne paqij li xwe dikir.

Pêxemberê me, zehf ji zaroyan hez dikir, û qedrê di wan digirt û nemaze bala xwe dida sêwîyan, û ji peyayên ko zaroyên sêwîf diezbandin, gelek dixeyidî. Pêxemberê me, jî bihnên xweq, ji gul û gulçêçekan û ji sihên dara hez dikir, û emrî imetê xwe kiriyê, û gotiye: gul û gulçêçeka û darên spehî biçînin. Pêxemberê me, ne dixwest rûyê derewkeran bîlîne, jî wan zehf aciz dibû.

Pêxemberê me, qedrê mirovên xwedîheq digirt, heq di pêşiya wî de zehf mezin bû û digot: peyayê ko xwedî heq e bi deng û awakî hişk û sar bipeyive jî, guhdînin, û jê me xeyidin. Pêxemberê me, jî jîna hez dikir, qedrê wan digirt û ew ne diêşandin.

Pêxemberê me, zêr û zîvê dinyayê heqîr didît ji xerîmetê jî xwe re parek ne distand, pereyê xwe dida feqîr û belengaza, sêwî û jînebiya, û digot: pêxemberên Xwedê jî bona rêberîya xwe, jî xelkê tiştêk na stînin, rehma Xwedê besî wan e.

Pêxemberê me jî mirovên xebatker hez dikir, û dixwest her kes bixebite û bi vî xebatê, nanê xwe bixwe û barê xelkê ne be, ne dixwest bi kîjan navî be jî, hin cihê xwe de, bi tenbelî û tirafî rûnin, bi eqlê xelkê bileyizin, û pereyê wan bistînin û pê îqê xwe biqedînin.

Pêxemberê me bi Qurana Şanmezin pêş me kiriyê ko bê destûra Xwedê di axiretê de, kes ni kare, arîkariya kesekî bike.

Jin û Mērik

Jin û mērik hebû; gelek wî zilamî jî jîna xwe hez dikir. Jîna wî ehlê Xwedê bû, tîzîkî kiri stoyê xwe hezar û libik, û pê werdê xwe dikîşandin. Mērik jî, li ber destê zilamekî jî xwe re dixebitî; wî zilamî hero şîva wî didayê û digot, here bila jîna te jî te re çêke.

Zilam şîva xwe dibir mal û dihat li sūkê dixwar. Hosteyê wî rojêkê, jê re got: kuro ez şîva te didim te, çîma pîreka te jî te re çênake. Mērik jî hosteyê xwe re got: pîreka min, jî ser secadê ranabe û jî mi'r dibêje: ya filan kes, encax, ez mêj û werdê xwe bikişînim, û tu dizanf werdê min gelek in; hezar û libik e; tu here, şîva xwe jî xwe re çêke, ê me, ez şîvê naxwim, dilê min jî cem Xwedê tēr bûye.

Hosteyê wî jê re got: malxerab, hi Xwedê jîna te bi dost e, wî got: na kengê, jîna min tiştêkî wîlo na ke. Hoste, jê re got: kuro, ka jî te re debenca min, û here binêr jîna te kî li cem heye.

Mērik debance girî û berê xwe da mal; hat devê derî, nêrî ko jîna wî zendên xwe hilkirine û hêka diqelîne, ew jî li ber derî ma sekinî, jî xwe re go: emê binêrin çawa ye.

Nêrî ko jîna wî deh firax xwarin danin ser sîfrê; û dî ko jî dostê xwe re got: kerem bik, were bixwe. Xwarina xwe xwarin, û kêf û henekê xwe kirin. Mērik jî, li ber devê derî sekiniye, li wan dinêre, nema wî jê diqere.

Debena xwe kişand û êrişî ser wan kir her du kuştin; û jî xwe re got: av û axa vî welatî li min heram e. Hat bajarkî wek Diyarbekrê. Hîngî feqîr bû û birçî bû, li ber dikanan radîze.

Şevêkê polîs lê rast hatin, jê re gotin: kuro, tu li vî derê çî dikî? go: bavo, ez xerîb im, ez kesî nas na bikim; go: zejna siltan vebûye, çey te vekiriyê? go: Bi Xwedê, ez belengaz im û ez xerîb im. Polîs rabûn, bi çepê wî girtin û birin serayê, û lēxistin.

Kurd go: min ne kiriyê, lê min bibin bigerînin li nav bajarê, ezê pêş we kim, ê ko vekiriyê. Roja îne bû, di ber deriyê mescedê re bihîrtin, miftî jî, ji mescedê derdiket, û tîzbiyek di destê wî de bû, hezar û libik bû. Go: bavo, dizê zejna siltan ev e. Polîsan jê re got: malxerab, miftiyê islamê ye! Go: bi Xwedê, hon min bikujin jî, jî wî pê ve, dizê zejna siltan tu ne.

Rabûn, birin, cem siltan; miftî, jê re gotin: miftî, te xizne vekiriyê! go: bi Xwedê, hayê min jê tu ne. Gotin, va şehdê te heye. Siltan go: rabîn, li miftî xîz; rahiştin darekî li miftî ket.

Miftî go: eman, bisekinin, bavo mi vekiriyê; bes çîlo vî zilamî feqîr zanf bû ko mi vekiriyê, ez ne dîtîme, û min nas na ke. Rabû, siltan jî feqîr re go: çîlo te zanf bû, miftî ev xizne vekiriyê? go: bavo, jinek min hebû, û tîzbiya wî, hezar û libik bû, û di dawiyê jîna min bi dost derket; gava min dît ko tîzbiya miftî hezar û libik e, mi seh kir yê ko xizna siltan vekiriyê ew e.

Brahimê METÎNÎ

Usifê Tenbûrwan

Brayê wan ûsif di şkeftê de maye, qûrê xwe dileyizine; û li hût dixîne; dibê bela ez bimirin di şkeftê de, û ez di nav lingê te re derbaz na bim.

Hût jê re got: tu xortekî delalî, çî heqê te li rûhê te heye, ko tu xwe di şkeftê de bimirin, şertekî min ê dî heye, heger tu bikî, tu ê xelas bibî.

Ûsif jê re got: şertê te ê din çîye?

Hût jê re got: şertê min ê dî Gulbarîn keça mîrê cîna, tu ê ji mi re bînî, tu ê soz bidî, ezê te xelas kim. Ûsif jê re got: baş e, hidûdê mîrê cîna pêş mi bike. Hût gote wî: baş e; were bi dî min de.

Canpola pê re çû heta hidûdê cîna, û jê re got: ji vir û wilo de ez nema karim bêm, de Xwedê bi te re be.

Ûsifê Tembûrwan, tenbûra wîna pê re ye, çîl tîl, li ser tenbûra wîna heye, her tîlekê çîl hawî dibêje, dengê wîna zehf xweş e, meşîya di nav bajarê cîna de; li ber dîwarekê rûniştî, tenbûra xwe li ser çonga xwe danî, û lédixîne û delalê xwe di ber re dibêje.

Ehlê bajêr, heçî dengê wîna dibihîse, dev ji kar û xebata xwe berdide û tê lê dîferice.

Bi vî hewayî du, sê roja ma. xeber ji mîrê cîna re çû, û jê re gotin: Delo Eliyêk hatiye vî bajarî û ehlê bajêr, sîk û dîkanên xwe girtine, û sîxlê di xwe hemî betal kirine, û li wî Delo Eli dîfericîn.

Mîrê cîna got: ez dixwazim Delo Eli, bê cem min, ev tiştê wiha xweş, lazim em ji bibînin. Yekî ji xulamê xwe şand dî Delo Eli, û jê re got: rabe, mîrê me te dixwaze.

Ûsif rabû ser xwe û bi xulamê mîr re hat, dîwanê; tenbûra xwe li çonga xwe danî û bi wî dengê xwe ê xweş, bi tenbûra xwe re got.

Adeta mîr heye, ew di qesrekê de ye, jîna wî, di qesrekê de ye, û keça wîna di qesrekê de ye, Heyanî ko her sê bi hev re taştî û firavîn û şiv bixwin, bê hevdu tiştêkî na xwin.

Ewê rojê mîr xwe ji bîra kir heya êvarê, ne xwarin û ne jîna wî û ne qîza wî, ne hatin bîra wî.

Jîna mîr, ji cêriya xwe re got: rabe, here, bê çî hewala mîr e, em birçî bûnê? Cêriya wî rabû çû, hate dîwana mîr, û nêrî ko tiştêkî ecêb, di dîwanê de ye.

Cêriyê ji xwe re got: mîrê me rokê xwe ji bîra kiriye, heger ev Delo Eli bê cem xatûna min, wê ew sê roja xwe ji bîra bike. Bi şûnda cêrî veşerîya, xatûnê jê re got: ya xatûna min, tiştêkî ecêb min di miçîsê de dî ye, û jê re qala deng û tenbûra Delo Eli kiriye.

Xatûnê go: de here, bela bê cem me jî; ma kî ji mîr re divê, ji me re navê. Cêrî çû, ji

mîr re got, mîr go: baş e, ji Delo Eli re go: rabe here aliyê malê, cem xatûna.

Delo Eli rabû, û hate cem xatûnê. Rojêkê li cem wê ji ma, qîza wîna du roja bê xwarin maye, cêriya xwe şand cem diya xwe go: binêr bê hewal çîye.

Cêriya Gulbarîn hat û veşerîya, xeber anî jê re, û hewala Delo Eli jê re got.

Keçikê go: bavê min û diya min pîr in, û kî ji wan re divê, ê me, em qîz in, ji me re navê, de here bila bîlezînin û wî bişînin cem min.

Cêrî hat, ji wan re got, diya keçikê ji Delo Eli re go: de rabe, here cem keça me Gulbarîn û kî jê re bibuhêre.

Delo Eli rabû, û bi cêriyê re hat cem Gulbarînê.

Gava çavê gulbarînê bi ûsif ket, hiş û aqilê wîna çû, û jê re got: de rûnê, tiştê ko tu lê digeriya û ez lédigeriya Xwedê da me.

Çend roja di wê kîfê de man, ûsif jê re got: wiha na be, lazim, ji me re ştektî tu saffî bikî; ez ji bona te hatime vî derê.

Gulbarînê jê re got: bavê min bi qelena, min na de, şertekî wî heye; gelek mîr û beg û axe hatine min û ev şertê bavê min, hilnanîne, ez newêrim vî şertî ji te re bêjim, ev şert tiştêkî zehmet e.

Ûsif jê re got: bêje, çî şert el Gulbarînê go: hemamek bavê min heye li ber avê, dixwaze wî hemama xwe avê bike, her sal ave dike, wextê ko timam dike, teyrik heye, tî baskê xwe li wê hemamê dixîne û ismê sîhrê lê dixwîne, hemamê xira dike.

Heçî ko kari be, wê hemamê bisilimîne, wê mi bidivê, û heçî nikare, serê wî jê dîkin.

Ûsif got: ez dixwazim herim, vî şertî bilînim; Gulbarînê jê re got: de here, di dîwanê de du kursî hene, yek ziv e, yek zêr e, heçî xwezgîniyê min e, li ser a zêr rûdinê; heçî bê, ko ji xwe re tiştêkî bixwaze, li ser a ziv rûdinê.

Ûsif rabû, çû dîwanê û li ser kursiya zêr rûnişt, mîr jê re got: kuro ev ne cîhê te ye, tu Delo Eli yî, tu hatiyî, ezê tiştêkî bidime te; li ser kursiya dî rûnê.

Ûsif jê re got: ev cîhê min e, ez ji bo xatirê vî kursiyê hatime. Mîr jê re mesela hemamê got, ûsif go: baş e, ez karim vî şertî hilînim.

Mîr hoste berda hemama xwe, ave kirin, roja ko timam bû, ûsif çû li ser pişta hemamê rûnişt, tenbûra xwe li ser çoga xwe danî û dengê xwe ê xweş pê re dibêje.

Ehlê bajêr ji dora hemamê reviyane, û ji hev re dibêjin, wextê teyir bê, wê wî xortî û hemamê berde bi avê de.

Ûsif carekî dî ko teyir hat, û xwe berda bi ser hemamê de, dengê ûsif û tenbûra wî, kete guhê teyir, pîr kîfa teyir hat, û di ser serê wî re, baskê xwe

kir sî, û guhdariyê lê dike.

Ûsif destê xwe avê lingê teyir, ji destê ûsif filitî, tiştê ket dawa wî, nêrî ko hingulîskek e, çîqa lê dinêre, li wî hingulîskê, tiştê wiha ne dîye.

Xeber bi mîr ve çû, go hemama te silimî. Bi def û zirna ve hatin pêşîya ûsif, li hespekê siwar kirin û anin dîwanê, û gelekê jê dilxweş bûne.

Ûsif ji mîr re got: tu li ser soza xwe ye? Mîr go: belê kurê min, rabe here, cem Gulbarînê, min dayî te, tu dixwazî here, tu dixwazî li cem me bimîne.

Ûsif çû cem Gulbarîn, kîfa wan bi hev du re hat, û jê re got: va diyariyek baş, hingulîskek mi ji te re aniye.

Kîfa gulbarîn hat, ûsif jê re got: de rabe emê herin.

Her yekê li hespekê siwar bûn û hatin hidûdê Canpola.

Canpola bihna wan kir û hate pêrî wan ve; li wê derê ûsif ji gulbarîn re got: hewala min û Canpola eve; tu ne ji mi re ye, tu ji wî re ye.

Li wê der ma'dê keçikê nexweş bû, dilê wê gelekî bi kul bû. Canpola hat, û rahiştê keçikê ji ser hespê û bihin kir, xwîna wê hemî ziwa kir.

Ji ûsif re got: here muhmeta sê roja ji te re ye, piştî sê roja ez te li kî der bibînim, ezê te hikim ax.

Canpola çû şkefta xwe, û ûsif ma bi dilê kul, ji xwe re gomcalek kola û xwe tî de vedîşere, di miqabilê şkeftê de. Îşê Canpola çîye? Sibehê derdikeve diçe neçîrê û êvarê tî.

Wexta ko dire, ûsif tî cem gulbarîn, kîf û heneka xwe dîkin heya êvarê, û êvarê diçe, di goncala xwe de, xwe vedîşere.

Çend rojan di vî hawayî de man. Rojêkê ûsif ji gulbarîn re got: lazim e tu bi hawakî li rûhê canpola bipirî, binêr rûhê wî li kû ye, ko em bikujin, heger ne wîlo be, em jê xelas na bin.

êvarê Canpola hat, keçikê xwe digirîne, Canpola jê re got: çima tu digirî? go: te ez anî me, di vî çolê de bi tenê, te ez danî me; ne kes heye sebra xwe ez pê binim; ez ji dî û bavê xwe kut bûme, û ez mame ji te re; ez pîr aciz dibim, tiştêkî ji mi re divê, ko ez sebra xwe pê binim.

Canpola jê re got: te çî divê? Keçikê jê re go: min rûhê te divê. Canpola kenîya û jê re got: ruhê min dîr e, ezê ji te re bêjim; ruhê min di qutikê de ye, û ev qutî, di kaba xezalkê de ye, ev xezal di deşta heywana de ye.

Kehnkî di wê deşta de heye, çîqa heywanên wê çolê tene ser vî kehniyê avê vedixwin, ev xezal heya ko heywanîk hebe, ew nayê, piştî ko heywana hemî av vexwarin, wê ewê bê ser kekniyê û heger bihna însana jî bike, wê bireve; û ev xezal tu carî na mire, heyanî ko tîr û kevanek ji sindiyane baş ji hedadî Diyarbekrê lê keve; û ev sindiyan tu carî na şkê, heyanî ko ne du mî, ji riha min, di bin de bê şewî-

tandin; piştê wê bişkê ev sindiyan.

Îcar ya Gulbarîn, tu li ruhê min dipirî, kî kare bîne. Gulbarîn go: îcar dilê min rahet bû, gûmana min jê qut bû.

Piştî ko Canpola raza, gulbarîn meqesek anî, çend mî ji nav riha wî qusandin. Sibehê Canpola çû neçîra xwe, ûsif hat cem gulbarîn, gulbarîn hewal jê re got; e ew çend mûyên riha wî dane ûsif.

Ûsif çû bajarê Diyarbekrê, çû dikana başhadad, li ber dikana wî sekinî, başhadad jê re got: tu çî dixwazî? ûsif jê re got: ez dixwazim tu min li cem xwe bişuxlîm.

Başhadad jê re got: baş e, tu ê çî bixwazî ez bidim te; roja te? ûsif jê re got: ez peran ji te na xwazim, soz tu ê bidî ji min re, heger sindiyanê te şikest, tu ê ji min re, tîr û kevanekî jê çêki.

Ê başhadad kenîya, go: lawo ji xwe re tiştêkî dî bixwaze, sindiyanê min tucar na şkê, go: bila, qe, ez vî şertî bi te re bikim.

Li cem ma heft heşt roja, roja inê bi ser wan de hat, başhadad ji ûsif re got: çavê te li dîkanê be, ezê herim, limêja inê. Piştî ko çû, ûsif ev mûyên dî, xwe derxistin û di bin sindiyanê de şewitandin, sindiyan teçîya; dengê wî çû başhadad hindurê mizgeftê de.

Başhadad hat û gelekî keyidî û ma'dê wî nexweş bû, piştê saetêkê bihna wî fireh bû, ûsif jê re got: soza xwe bi çî bîne, ji mi re tîr û kevanekî çêke.

Başhadad jê re tîr û kevanek çêkir, ûsif çû deşta heywana, li ber kehniyê ji xwe re gomcalek çêkir û xwe tî de vesart.

Dinya germ bû, nêrî ko heywan sef bi sef hatin ser avê şer û piling û rovî û gur û fil, çîqa heywanên ko hene hatin av vexwarin û çûn.

Ûsif nêrî ko xezala wîna ji wê ve tî; hêdî, hêdî ji xwe re diçêre, û nêzîkî, li avê dike.

Giha ser avê, bihna însana kir, ew xezal reviya, miswarekî xurt beziya ber bi çolê de; gelekî tî bûye, carekî dî veşerîya.

Hat û devê xwe xiste avê, ûsif ji xwe re got: ez vî xezalê li ser avê de na kujim, îro ne bû sibe.

Piştî ko xezalê av vexwar, ji ser avê bi paş de çû, li xwe fitilî û bi stureyêdî di xwe, xwe dixurîne, ûsif tîr û kevan berdayê, xezal kuşt, çû lingê wîna şkenand, ev qutî ji qaba wê bi der xist; anî û hate cem Gulbarîn.

Qutî vekirin, dîtin ko sê qurmik tî de ne, dido kuştin, ma yek, tayê bi qirka Canpola girt; hêrî ber bi şkeftê ve tî, ban kir; ez li bextê Xwedê û we me, honê min ne kujim. We du qurmikustin, yekî bihelîn, heyata min wînda me kin.

Ûsif dixwest vî qurmê bidivê, Gulbarîn rahiştîyê û perçîqand. Nêrî ko Canpola di cîhê xwe de mir.

Her du hatin di qesra xwe de man bi dilxweşî; sibehê Ûsif rabû û çû bajêr, her du brayên di xwe kuştin û ma hakimê bajêr. Kurdistanê û serê hazira sax be.

Stranwarî

Der Warê Stran û Dilanan

Ehmedê Ferman

Bistkî Wer

Êvarekê bi dengbêjê me e delal Ehmedê Ferman re. Kela-mêrê Ktkan, ronîya çavan, xit-yarê civatan, berdevkê maqûl û axan, û berdilê ciwan û xortan.

Edlê Rabe

Edlê rabe sibe ye
Dengê dika qebe ye
Kes li mala tu ne ye
Kêf kêfa min û te ye
Deynê min li bavê te ye

Ba rabû, baran rabû,
Ecaca kerîyan rabû,
Karika pîhoş wînda bû
Gundî, malî bela bû
Ez û gewrê pev çar bûn

Çiya li çiya nerî
Werdek ji gola firî
Xwar bûm Edlê ramîsim
Destê min lê nagerê.

Hat karwanê gamêşa
Danî bû li bînya êşa
Memkê Edlê digiwêşim
Dilê min ji kerban têşa.

Ha der bû, der bû, der bû
Karwanê Edlê der bû
Hemî hêstir û ker bû
Hemî qantir û ker bû
Hespê Edlê qemer bû
Çekê xorta li ser bû.

Mala Edlê li neqebê
Lê hat bayê kezêbê
Derdê Edlê giran bû
Da ser sîwarê neqebê
Derdê tolê giran bû
Da ser derdê kezêbê.

Lê gidiyê Edulê
Porsorê, gulê hûrê
Dosta lawikê maqûlê
Wer ser dora tenûrê
Lawik Edlê revandî
Bir xopana Stenbûlê
Lê gidiyê Edlayê
Mi d'pozê bavê gayê
Tu li pê soza xwe nayê.

Qîza qêxê Teyayê
Xîlxala ling kutayê
Kember li navê nayê
Bazîna dest badayê
Çav ji zêra hîlnayê
Çi b'kim malê dinyayê

Ev sibe ye, ro zîz e
Ro li erdê dilîze
Derdê min yeke qîze.

Kezîzer

Kezîzerê, kezî zer
Kezîze ê lewendê
Sing doşek balîf zendê
Zeriyê l'were dilanê
Gewrê were govendê
Kezîzerê kezî zer
Xulama memkê girover
Serê sor e; bîni zer
Mîna berfa nevala
Sîya dara tim li ser
Tu j'govendê were der
Te ramîsim çar din her
Kezîzerê min sîsê ne
Her sê delalîyê dê ne
Yek min, dido xelkê ne
Lo erdiko beyaro
Minê çandî xiyaro
Çi b'kim dosta bi yaro
Esil dosta qîzê ne
Mîna şekir şîrîn e
Mîna agir bi lîn e
Mîna gula bi tîn e.

Bistkî wer mala me ye
Tişkî bibe mane ye
Singê mi j'te re beşçe ye
Gul û rîhan tede ye.

Meskenê min û te ye
Hey lê gidiyê Nazîyê
Çelebiyê

Xulama deqa li aniyê
Wer'em herin kaniyê
Gundî, malîya çî j'me ye
Diyarbekir bi derge ye
Nisêbnê bi qîşle ye

Girherînê beşçe ye
Mêrdînê di ser re ye
Cihê min û te ye
Heval û hogira çî j'me ye.
Îşev şeva berfê ye
Cîya dîne li hewşe ye
Destê xwe, bi destê mi de
Wer'em herin çolê ye.

Îşev şeva baranê
Cîya dîne li heywanê
Destê xwe bi destê mi de
Emê biçin nevalê.

Gulê, gulê

Kevoka Qitîrbilê
Qeymaxê ser satilê
Gul dosta axê minê
Lawê Zeyto j'xwer birê
Bir xopana Mûsilê
Destê xwe kir paşilê
Çî paşilek xweydayê
Serê memîka hildayê
Memîk para xortayê
Tiştîk me tê, ne mayê.
Ez na çim beşçe gula
Ez na rim taxa fila
Lê gulê, gulçîçekê
Çavreşê meşordekê
Rîhana li ser doşekê
Ez rûniştîm li kêlekê
Ezê gulê birevînim
Bibim bajarê Siwerekê:
Heçî bi dilê xwe zewicî
Sê ro dizî ji felekê.
Ez gul im, gulspî me
Nav beşçeya efendî me
Dosta lawikê xwey cindî me.

LAW OSMAN E:

Lê yadê law Osman e
Biçûk li tenbûrvan e
Qedre zeriya j'xwe nizanê
Bi vi erdê, bi vi ez nane
Naçim suxra vi Çaçanê
Ka bazînê te j'mîr ani
Ka xîlxalê te b'xwer'ani
Lê Dînê, zalim Dînê
Tîrsa min j'hebsa Mêrdînê
Ziyareta Kilêbinê
Te lawo bîmîre narim şanê.

Osmanê xerbende ye
Te rêkirî mala me ye
Desmala zer kir mane ye
Singê bê bavê
Mîna berfa li xirbe ye
Êmişê devê te ye

Nedîn im, ne dirust im
Taq rîhanê, pêlê xist im
Teresbavo
Pišta mi girtin, li erdê xistin
Du parsûyê min ne xuyane
Sê parsûyê min şkestin
Ez ne dîn im, ez ne har im
Taq rîhanê pelê pan im
Pišta mi girtin, li erdê dane
Du parsûyên min ne xuya ne

De lîl, de lîl, de lîl, de lîl
Ketim beşte bavê Cemîl
Xodo, rebî, kes tê ne min
Lê yadê law Osman e

Palas Hotêl

Du rêz têlên bi stîrî, dora avahiya ko tê de, mezinên germanistanê ên berê rûniştine, digire. Nobetdar pêşîya van têlan de, diçin û tîn. Bi fîpine mezin, li ser texteperçeyan nivîsandîye: «rawestan hindurketin bend e.»

Eve derîzana Palas Hotêlê, li Mondorf-le-Ben, li Luksemburgê: Hotela ko nihû girtîgehê e û tê de suçdarên elemanî ên şerî i mezinîr rûniştine. Goering, Rozenberg, Sayis-Inquart, Ribentrob, van Papin, Diktor Ley, û emîral Doenitz.

Mareşalên elemanî Keserling û Kaytel, jî, di vê de ne. Lê ev her du fermendar, hêj nayin hesibandin mîna suçdarên şerî. Di hindurê beşçeya ko Hotêlê tê de ye, zehf têlîne bi stîrî ên dîn hene û gelek eskerên ko nobetdarîyê dikin.

Pencreyên hotêlê bi dereban hatine qaim kirin, hûr û mûr di hindurê mezelan de zehf kêmin; bi tenê tiştên ko mirov bi vê ne vê, hewcedarî wan in, mîna textek, kursiyek, û cihê şuştinê.

Suçdar di tebeşa çaremîn de rûdînin. Diktorekî elemanî li wan muqate dibe. Diktora niho Goering derman dike, ye ko bi arsimî ketiye. Goering pir ji Keserling hez dike, û ew dostê wî ê çêtir e.

Goering, zehf ji nesaxiya dilê xwe, gazindan dike. Nobetdarên di wî dibêjin ko ew ji gureguren ezmanan û bruskan ditirse. Hêsr hemî, dibêjin ko ne nazi ne, û tiştê ko kirine, eve ko emrên dayî, anîne cih, û jê pê ve, tu sîç û qebhetên wan nîne.

Di pêşîya serbend û serhengên emêrikanî de, yên ko ew istintaq dikin, Goering û hevalên di wî, xwe zehf zirav dikin.

Rûyê hêsrînan qermeçî ne, û westabûna şevên bê xew, jê xuya dike. Ribentrob, zehf li ber halê xwe dikeve û bê etîahî ji nobetdarên xwe dipirse; gelo heqê wî de, çî tete gotin, û gelo kengê wî bête rêkirin pêşîya mehkemê.

Heçî Dr. Ley, xema halê xwe na xwe û heke rê pê ket, ji xelkê re şîretan dike û dixwaze bide zanîn «Elemanya Nû» bi çî awayî divê bête ava kirin.

Ez Ji Cehnemê Têm

Feqtrekî kurd hebû, çî bajarê Diyarbekir, ji sibehê heya çavê gerîya, tiştêk bi destê wî ne ket, hat ber qesrek bilind ji xwe re sekîni.

Qîzek ji wê Qesrê daket, jê re got: ya feqîr tu çî dikî li vê der, tu ji kû tî? Feqîr ji behca xwe re, go: ez ji Cehnemê tîm. Qîzê jê re got: tu ji cehnemê tî? go: erê! Qîz bani ket for, ji xatûna xwe re go: ya xatûna min, va şîtanekî li ser rê ye, dibê ez ji cehnemê tîm! Xatûnê go: ban ke, belê bê vir! Qîzê ban wî feqîrî kir, feqîr hat cem wê, xatûnê jê re got: ya lawê min, bi rast tu ji cehnemê tî? Feqîr go: erê.

— Go: lawê min heye, navê wî Salih e, te ne di, li wan dera?

— Go: ez Salih nas dikim,

— Go: halê wî çawa ye

— Go: ya xatûn, halê wî pir perîşan e, xmas e, ser tazi ye, cilên di wî qetiyayî ne! xatûnê go: ezê peran bidim te, tu jê re na bî? Feqîr neri ko xatûn xesim e, go: ez ni karim peran bi xwe re bibim; îşê min heye, ez hatime îşê xwe.

Xatûnê go: ez li beşte Xwedê, û li bexte te me, ezê çar sed zêrî bidim te, tu ê bibî jê re, û deha ezê bidim te, ji te re, heqê te! Feqîr go: de xem na ke, de bîne! Çarsed û deh zer ji xatûnê standin, û ji wî bajarî bi der ket. Êvarê mîrê xatûnê hat; xatûnê ji mîrê xwe re got: îro yek ji cem Salihê me hatiye, û go halê wî pir perîşan biye, bi Xwedê, min çar sed zêr jê re şandine.

Mêrê wê ma ecêbmaşî, go: te çawan pere şandin, ev pênc salê wîna qediyane ko miriye, û tu jê re peran dişîni, bi kû de çî ewê ko pere ji te standine? Xatûnê rîga ko feqîr pê de çûye, nişani wî da; mîrêk li hespê xwe sîwar bû û bi dû feqîr de çû.

Ê feqîr, bi dû xwe de neri, ko siwerekî bi pey wî de tê; wê çawan bike ê feqîr. Dit ko yekî colkarî, neri ye ko gurri ye jî, Feqîr jê re got: Ev siwarê ko ji wê ve tê, heçî mirovên gurri dibîne, serê wîna jê dîke; e colkarî go: ez çawan bikim? Feqîr go: here li ser vê darê xwe veşêre ezê ji dîl te ne col bikim; heyani ko ev siwar bibihore.

Ev siwar giha cem colkarî, jê re got: kuro te ne di tu kes di vir re çû? Feqîr jê re bi dizî go: va ye, li ser darê ye. Ev siwar çû di bin darê û ban ê gurî kir go: were dakeve, di fikra wî de eve ko pereyên wîna birine. Ê gurî go: ez dana-kevîm. Ewê siwar ji hespê xwe daket, cizma xwe ji lingê xwe kir, şîrê xwe danî erdê û bani ket ser darê; bi destê wî gurî girt û go: çûna ez ban te dikim û tu danayî? Ê gurî go: ez ne gurriyê tam im, porê min heye, ji bo çî serê min t'ê jê kî? Ewê siwar jê re got: kuro tu çî dibêji?

Ê gurî go: niha yek ji wê ve hat û ji mi re got: ev siwar serê gurriya jê dike; û ez hatime ser darê û ew ji dîl min ve col dike.

Heya mîrêk ji ser darê daket, nêrî ko feqîr hespa wî, û cizma wî û şîrê wî jî rewanîye û pûye. Bi lînga vegeriya mala xwe, jîna wî jê re got: te çawan kir? go: mi şîr, û hesp û cizma e ji ji Salih re şandîye; bila lê siwar be!!..

Kew û Rovî

Roviyek ji xwe re digere li çolê, rastî kewekî hat, xebera kew jê tu ne, kew ji xwe re got: ê ko xewa wî naye, çawan bi derew radize; ezê xwe biceribînim, kew çavê xwe girt û dikî ko raze, ro-vî ji par re çû û rahişte kew bi devê xwe re, kew nêrî ko di devê rovî de ye; û ji rovî re got: te ez girtim, ez nesibê te me, bêje elhemdulil-lah!

Rovî got: elhemdulil-lah, devê wîna vebû, kew firiya, miqa-bilê rovî danî, rovî ban kire kew go: mala wîna ne ava be, heçî ko birçî be û bêje: elhemdulil-lah. Kew jê re got: mala wî ne ava be heçî ko xewa wî neye û bi derew raze.

Ereqvexwar

Beri bi qeş mehan, kurdek ji yê Bêrûte hat cem min, û qala nesaxiya xwe kir. Bi awakî xurt dikuhiya û dengê wî keti bû. Me kir ne kir halê wî çêtir ne dibû. Ev peya hemal e, etaliyê dike, di bin barê xelkê de, hero difetise û di halekî gelik perîşan de ye. Piştî sê mehan ew hinik çêbû û dîsa hat nik min.

Me qala nexweşiya wî dikir û mi jê re digt: ez ecêbmayî dimînim, te ev nesaxî çawan girt. Piştê axaftinê dîr û dirêj, me seh kir, ko ew di Bêrûte de etemî ye, û ereqê vedixwe, her qeş û kasikên mezin bê av, û du kasikên din bi av û meze.

Min jê re got: heke te bi xwe ne gota, min bawer ne dikir; sihetek na elimî, zimanek na elimî, û çawan diçî tiştê ko di dîngê me de heram e, û mala xelkê diqewitîne dielimî.

Eve halê hina; û her wekî dibihîsim halê hinên ko, ji ber ko hatine bajarekî, û cilekî spehî li xwe kirine, bawer dikin, da ko bibin efendî divê ereqê vexwin. Ev bela mezin, divê ne keve nav xelkê. Divê em, hemî berberiya vê adetê pîs bikin. Ereq jehr e, heke tiştêkî qenc biwa, ji xwe dîne me heram ne dikir.

Ji ereqvexwara re dibêjim pismaminol vî tiştî me kin, pê zaroyên ko sibe ji piştê we kevin, dê bibin zaroyine reben û nesax, zaroyên ko bi kêrî xwe nayin, navê we, sibe pîs dikin. Diz û ser xweş, bêbext û bê namûsan, ji kurê ereqvexwaran derdikevin Herin sinheta, ma'rifeta bielimîn, herin zimana bielimîn, herin ji bona qenciya miletê xwe, gund û eşîrên xwe bixebitin û dev ji vî tiştê pîs berdin.

Heke hon bawer dikin ereqvexwarin marifetek e, ne wilo ye; bidin kerê xwe, ko elimî ew jî dê vexwe. Heke bawer dikin, pêşveçûn e, ne wilo ye; welatê Emerfkayê de ko bê sinheta di wê, zora elemana ne dihate birin, di Emerfkayê de, ko bi zanî, sinhet û marifetê, rêberê Cihanê ye, ereqvexwarin, hati bû yesax kirin, ji ber ko pê mîlet perîşan dibe; ma perîşaniya me ne bes e?

Mele û Gundî

Mele çû ser bêndera zilamekî, wî zilamî bêndera xwe didêra; ji mele re go: Mele, tu dizanî, şeytan ji mi re dibêje çî? Melê go: dibêje çî? go: dibê, rahêje vê melhebê û li nava qehfê melê xe.

Melê go: na, malxerab, şeytan dijinê Xwedê ye, ko jê be a qenc na ke, û jê bê, erş û kursî wê xera bike. Di du saetkê re, zilâm car di jî melê re go: mele, tu dizanî, şeytan ji min dibê çî? Melê go: dibê çî? go: dibêje, ji ber bendera xwe derkeve, û teslimî melê bike.

Melê, jê re go: Ma tu zanî çî ye, bihostek ji erdê ne ma, ko şeytan ibadet ji Xwedê re ne kir, bes niha ew û Xwedê hebîk ji hev û du xeydîne, bes ew pîr qenc e.

SIRÛKAHIYA DÛK Û ROVÎ

Dîk û rovî ji hev du re gotin, emê bi gîrkayî cot bikin. Rovî rahişt, halet û nîrî xwe hilgirtin, heywanên xwe dan pêşiya xwe, û ji dîk re got: tu bizrê xwe bine.

Rovî çû colê, heywanê xwe bi xwe re birin, dîk rahişt tofê xwe, bi rê de birçî bûye, tofê xwe hemî xwarin.

Çû cem rovî, rovî jê re got: kanî tofê ko te anî, go: mi xwar; rovî jê qeherî û şeqamek li dîk xist; dîk tirek kir; go: emê herin şerletê; çûn cem kund. Kund ji wan re got: hon bi çî îfî hatine cem min, go: em hatine şerletê cem te, go: bêje: rovî got: min û dîk şerkañî bi hev du kir, kund ji wan re got: we bêaqilî kir. go: me cot girêda; me tofê xwe ji bîra kir.

Kund ji wan re got: we bêhiştî kir go: dîk vejeriya, tofê me anî, û bi rê de xwar. go: bênefsî kir!

Rovî go: ma ne mi şeqamek li dîk xist û tirek kir.

Kund go: ji kêmtaqetî kir, ji hev veqetin.

Çiyayê Mazî

Ne minîm, ne minîm, Reşîto Lawo! Di dû çavê bavê Reşîte xwe re ez li dinyayê ne minîm.

Şerki dibû, li Dêrika çiyayê Mazî, li qible ye; deng û top û mitralyozê dewletê, li ser qesrê û qonaxê bavê Reşîte min hewale yel... Ez ne ketime bi xema kuştina bîst û du mêran!...

O, lo, Reşîto lawo, ez ketime ber namûsa xwe yel Çawa, îro sê ro, li nav eskerên dewletê, bû talan û yezme ye...

Reşîto, lawo, mêrê çê be, çê bixebite, kozika milê bênderê bermede; Heya bi kubarana sibê re, heyra ko Sadiq axa, xudanê qezatora mériyê, dihana me tê...

Şerki dibû, li Dêrika çiyayê Mazî, li qiblete; mi di dengê top û mitralyozê dewletê, li ser qesrê û qonaxê Reşîte min hewale tê...

Reşîto, lawo, ez ne ketim, ber xema çar salên eskeriyê; Çawan, mi di bi çepê Mihemedê Sinan, keyayê Dêrikê girtin, berê wî dan xopana Diyarbekir, avêtin hebs û zindiyana nezaretê.

O, lo, Reşîto lawo, mêrê çê be, çê bixebite, heyani ko bi kubarana sibê re, hawar dimbila, dihana me tê...


O, lo, Reşîto lawo, di dû çavê bavê Reşîte xwe re, li dinyayê, ez ne minîm!...

Şerki dibû li Dêrika çiyayê Mazî, bi du ciya; mi di, deng û borizanê dewletê li ser qesrê û qonaxê Mihemedê Sinan, keyayê Dêrikê dihatiyê... Ez ne ketime, ber xema kuştina bîst û du mêran: mi di çawa bi çepê Mihemedê Sinan girtin; berê wî dane xopana Diyarbekir, avêtin hebs û zindiyana xwîniyan.


PÊJINÊN DINYAYÊ



Hiş û bedenên xortan, divê xurt û saxlem bin; ev, der hemî welatên pêşvekefî, qeydeyê heja û bi qîmet e. Diya Kralê Britanya Mezin bixwe tê erdê ko tede leyistokên bedenparêziyê çêdikin û bi hatina xwe nav di xortan dide, da ko xweş bixebitin û heja bûna xwe şani mêzkeran bidin.



Bedenparêzî û pêşgîlîswarî pev re girêdayî ne, û di welatên Ewropayê de, û nemaze der Frensê, zehf pêşgîlîswar hene. Wêneya jorin şanî pêşgîlîswarên Frensê dide, yê ko li ser riyên çiyayan ên xweşçêkîrî ser ji hev û du distinin.



Xelkê Çekoslovakayê gelek bala xwe didin bedenparêziyê. Zehf civatên çekoslovakî ên bedenparêz, di çar gûşeyên Cihanê de, xwedî deng û pêjin in; û ji civatê wan ên mezintr re Sokol dibêjin. Bi arkariya dewletê û hemî Xelkên welat, ev civat ji bona xurtandin û zêrekîya beden û gewde û gurçikên xortan dixebite. Wêna jorin ciwan û ciwanmêrên Çekoslovakî pêş me dike, yê ko bi leyistokên bedenparêz mijûl in.